



BUROYA KURDÎ ya Pêwendî û Agahdariyê

Bultena agahdariyê N° 69 - Çile 2011

Quai aux Pierres de Taille (Arduinkaai) 11, 1000 Bruxelles - Tél. 02 219 80 60 www.kurdishbureau.be
kurdishbureau@scarlet.be

XEBATA BUROYA KURDÎ

Kanûn 2010

KONFÊRANS



12.12.2010 : Rewşa siyasî ya Kurdistanê berê şerrê cihanê yê yekemîn

Dîrokzan Wezîrê Eşo got ku berê destpêkirina şerrê cihanê yê yekemîn, Kurdistan weka sîteleke germ ku bi serhildanan dikeliya, difûriya, bû. Sedema bingehî ya vê rewşê pelixandina Tirkan û Farisan (Imperatoriye osmanî û farişî), ku Kurdistan dagîr (işgal) kiri bû, bû. Ronakbîrên kurd bi rêxistin, rojname û kovaran hestê neteweyî li bal gelê kurd geş dikir. Amanca wan pêkaniya serhildaneke giştî ji bo azadkirina Kurdistanê bû. Welatên ewropî û Rûsya ji bo biserketina serhildanê dixebitîn, lê amanca wan qet ne azadkirina gelê kurd, lê bikaranîna serhildanê ji bo dagîrkirina welatên ku Tirk dagîr kiri bûn, weka Kurdistan, Ermenistan û hin welatên erebî, bû.

Dîrokzan li ser hin ji van serhildanên kurdî, ku li bin imperatoriya osmanî, berê şerrê cihanê yê yekemîn bûn, nivîsî. Ev serhildan ji sedema newekheviya hêzên leşkerî yên kurdî û yên dagîrkeran û ji bo ku welatên ewropî alîkariya Kurdan ne kir hatin pelixandin. Ji van serhildanan : Di 1913 de, li perça Kurdistanê ku li nav sînorên imperatoriya osmanî bû (îro : Kurdistanê Tirkîye, Iraq û Sûriye), serhildan nemaze li navçeya Mûsilê dest pê kir. Di Nîsan 1913 de, navendên serhildanan Cizîr, Mîdyat, Hesênkeyf, Diyarbekir û Sêrt bûn. Lê serhildana girîngtirîn a Molla Selîm, ku tê de malbata Bedir Xan, Seyid Taha û Sîmko roleke mezzin lîzt, bû. Çek ji wan re ji aliyê Kurdên Xoyê (li Kurdistanê Îranê, ku li bin imperatoriya farişî bû) dihatin dayîn. Hukûmeta tirkî bitenê bi saya çekên giran karî bû vê serhildanê bipelixîne. Hin ji berpirsiyarên wê, weka Seyid Elî û Şehabedîn, hatin bi dar ve kirin.

Bi ser de jî, serhildan li Kurdistanê Iraqê ya îro, bi birêvebirîya Mehmûd Berzencî û Ebdul-Selam Berzanî, bûn. Ev yek ewê bibe babeta konferansa wêbê.

BEŞDARBÛNA XEBATÊN RÊXISTINÊN DIN

01.12.2010 : Koma Libêral (ELDR) a Parlemeta Ewropî û TUSKON (Turkish Businessmen Association) : Konfêrans li ser guherîna pêwendiyên di navbera Tirkîye û Yekîtiya Ewropî de, piştî destûra nuh a tirkî : "A revised Turkey's Constitution – Revising Turkey's EU Prospects".

Konfêransker ev bûn : Banû Annemie Neyts-Uyttebroeck, parlementereke beljîkî (flaman) li Parlemeta Ewropî û seroka koma libêral (ELDR) a vê parlamentê.

Wê pêşgotin û birêvebirina konfêransê kir. Hugh Pope, birêvebirê projeya Tirkîye/Qibris a rêxistina International Crisis Group û nûçegihanê berê yê Wall Street Journal ji bo Tirkîye û Rojhilata Navîn. Rizanur Meral, serokê TUSKONê.

14.12.2010 : Citizenne : Mi-dialoog : Traditie versus moderniteit (Tore “urfûadet” li hemberî nûjenbûnê)

Fikri El-Azzouzi, Berberêkî ji Maroko, romana xwe ku bi zimanê hollandî nivîsiye, “Het schapenfeest” (Cêjna

qurbanê), ku tê de di jiyana xwe de cîyekî dide bawerîya xwe ya olî, pêşkêş kir. Piştî, birêvebira Muzeya Cihû rewşa Cihuyên li Beljîka ravekir û mêvan vexwendin seredana muzeyê.

14.12.2010 : Navenda Lêgerînên Ewropî Centre d’Etudes Européennes) : rêşepsyona (koktêl) Noëlê (Christmas)

ENCAMA XEBATA BUROYA KURDÎ DI 2010 DE

1- Xebata rojane

- Alîkariya civakî (servîs sosyal)
- Fêrên zimanan : Kurd, Misrî, Rûs, Îranî, Bulgar, Moldav, Beljîkî (Beljîkî dihatin fêrên kurdî)
- Pirtûkxane bi nêzîkî deh zimanan, mêdyatêk : Kurd, Beljîkî û yên din (nemaze xwendekar û rojnamevan)
- Sekretarya
- Nivîsîn û wergerandina bultena mehane ya agahdariyê.

2- Xebata mehane

- Bultena agahdariyê : 12 hejmar, 57 – 68, bi çar zimanan : Kurdî, fransî, hollandî û inglîzî. Ew ji 2.000 navnîşan bêtir re hat şandin û li malpera www.kurdishbureau.be hat weşandin.
- Konfêrans li ser dîrok, çand û rojnamevaniya kurdî, koçbûna ber bi Beljîka û Ewropa, û mafên mirov li Tirkîyê : 10
- Nîşandana filman : 1

3- Xebata salane

- Newroz : rêşepsyon (koktêl)

4- Hevkarî bi rêxistinên din re

- Wergerandin bi têlêfonê û carna li cîyên cihê, bi hevkarîya Bruxlles-Accueil (Brussel-Onthaal), ji bo Kurd, Îranî û Afxanan : 395 car. Piraniya van wergerandinan ji aliyê Zaralî Nikraweş hat kirin.
- Konfêrans : 1
- Heveyvîn : 4
- Fêstival : 2
- Seredanên birehber : 1
- Civîn, rasthatin, “ateliers, workshop” : 52

Beşdarbûna çalakiyên ku ji aliyê rêxistin û sazendeyan hatin pêk anîn

- Semîner, konfêrans, konfêransên navneteweyî, konsêr, rêşepsyon ... : 22

NÛÇE JI KURDISTANÊ

Kanûn 2010

KURDISTANA TIRKIYÊ

53% JI KURDÊN TIRKIYÊ XIZAN IN

Li gora şirketa vekolîn (ankêt) û lêgerînan KONDA, 53% ji Kurdên Tirkiyê xizan (feqîr) in û 23% ji wan li bin xêza xizaniyê dijîn. Li bal Tirkan, ev xêz bitenê 4% e.

(aknews.com, netkurd.com, 03.12.2010)

XWEPARASTINA BI KURDÎ LI DADGEHÊ

Diyarbakir

Dadgeha cezayî ya 4mîn a Diyarbakirê pejirand (qebûl kir) ku tawanbarên kurd parastina xwe bi kurdî bikin. Ji berê jî, dadgeha cezayî ya 6mîn a heman (eynî) parêzgehê (wilayet) daxwaziyeke weha ne pejirandi bû. Ev dadgeha 4mîn li doza endamekî PKKê, Temiz Yüz, dinêre. Ew bi şandina pakêteke mînkirî ji endamekî din ê PKKê re, Şemdin Sakık ku li zîndana Diyarbakirê ye, hatiye tawanbar kirin.

(avestakurd.net, 26.11.2010)

Riha (Urfa)

32 ji 33 tawanbarên kurd ku hati bûn birin dadgeha cezayî ya 5mîn a Rihayê parastina xwe, bi riya wergêrekî (tercuman), bi kurdî kir. Ew ji 98 endamên partiya BDPê, ku ji sedema xwepêşandanekê (meşîn) hati bûn tawanbar kirin, in.

JINEKE ŞAREDAR TÊ RAGIRTIN

Şaredara (seroka belediyye) Geverê, li parêzgeha Colemêrgê (Hakkari), Ruken Yetişkin, hat ragirtin û birin zîndana tîp E, li Bedlîsê. Ev yek ji sedema beşdarbûna wê di 2004 de çalakîyekê li taxa Bağcılarê, li Istanbulê. 7 kesên ku bi “propaganda rêxistineke terrorist” hati bûn tawanbar kirin hatin ragirtin.

(rizgari.org, 06.12.2010)

BINÇAVKIRINA ŞAREDAREKÎ

Di 07 Kanûn 2010 de, polîs ket mala şaredarê bajarokê Bazarîkê, li parêzgeha Qersê, Ayhan Erkmen. Û wî avahiya şaredariyê jî dagîr (işgal) kir. Li mala wî, polîs kompyûter, gelek pirtûk û belgeyên wî birin. Piştî, wî ew bir navçeya Dîgorê û li wira ew bin çav kir. Ew bi „endambûna rêxistinekê» hatiye tawanbar kirin.

(rudaw.net, 07.12.2010)

ŞAREDAREK Î 6 KES TÊN TAWANBAR KIRIN

Dadgeha 3mîn a cezayên giran a Malatya 6 kes, ku ji wan şaredara Dersîmê, Edibe Şahîn, û serokê encumanta şaredariyê yê vî bajarî, Serdar Erdoğan, bi 5 sal û 8 meh zîndan, ji bo „propaganda rêxistinekê“, tawanbar (mehkûm) kirin.

(rudaw.net, 09.12.2010)

ROJNAMEVANEK TÊ RAGIRTIN

Sernivîskara berê ya kovara jinan a kurdî „Rengê Hêviya Jin e“, Berivan Eker, bi gûmana (şubhe) „propaganda rêxistineke illêgal“, li ser bingeha weşanên Hezîran û Tîrmeh 2010, hat ragirtin. Ji berê jî, di sala 2010 de, sernivîskareke din a berê ya heman (eynî) kovarê, Gurbet Çakar, bi 20 sal zîndan hati bû tawanbar kirin. Nuha, 26 rojnamevanên kurd li zîndanên tirkî yên cihê ne.

(azady.nl, 09.12.2010)

DU PARLEMENTER BI KURDÎ LI PARLE-MENTÊ DIPEYIVIN

Di 11 Kanûn 2010 de, parlementerê partiya kurdî BDPê, Hasip Kaplan, li eywana parlamenta tirkî bi kurdî peyivî. Têlêvîzyona fermî ya tirkî, TRTê, qeydkirina dengê wî birrî.

Di 12 Kanûn de, heman parlementer, Hasip Kaplan, li heman eywanê helbesteke Cigerxwîn xwend. Heman kanala têlêvîzyonê cardin dengê wî birrî. Piştî riswakinên (protêsto) wî, seroka civînê destûr (izn) da wî ku helbestê bixwîne. Piştî, parlamenterekî din, Sırrı Sa?kık, sansura têlêvîzyona tirkî riswa kir, anî bîran ku ev roja cihanî ya mafên mirov e û ku bi vê hincetê wî dixwest ku silavan li beşdarên bi kurdî, “Roj Baş”, bike.

(netkurd.com, 12.12.2010)

9 KURD TÊN RAGIRTIN, 1 TÊ BIRÎNDAR KIRIN

Di 11 Kanûn 2010 de, jandarma Geverê (Yüksekova), li parêzgeha Colemêrgê (Hakkari), du mînîbusên ku tê de 9 endamên partiya kurdî BDPê hebûn rawestand. Hemî hatin avêtin erd û yek ji wan, Sedat Karadağ, 33 salî, darbeyeke tabancê li serê xwe xwar û birîndar bû. Ew nuha li nexweşxanê ye. Bi hezaran rûniştevên Geverê heta şeva dereng riswa kir.

(netkurd.com, 12.12.2010)

DADGEHA EWROPÎ TIRKIYÊ TAWANBAR DIKE

Dadgeha Ewropî ya Mafên Mirov Tirkiye ji bo qedexekirina partiya ku bi awakî ne fermî kurdî bû, HADEP (berê ku bibe BDP) tawanbar kir. Dadgehê bi yekdengî biryar stend ku Tirkiye bend 11 ya Peymana Ewropa ya li ser azadiya xwepêkanîne pelixand. Wê Tirkiye bi dayîna qerebûyan (tawîzan), ji 2.200 € heta 24.000 €, tawandar kir.

(azady.nl, 14.12.2010)

PIRTÛKEKE DIBISTANÎ LI SER ZIMANÊ KURDÎ

Li konfêraneke çapemeniyê li xwaringeha (rêstoran) Cezayirê, Weqfa tirkî ya Dîrokê (Tarih Vakfı) pirtûka bi tirkî “Kürt Dili ve Edebiyatı Ders Kitabı” (Pirtûka Dibistanî ya Ziman û Wêjeya Kurdî) pêşkêş kir. Ev pirtûk di çarçeva projeyê de bi navê “Rola perwerdê di lihevhatina civakî de” hatiye weşandin.

(rizgari.org, 15.12.2010)

BOMBOKIRINA KURDISTANA IRAQÊ

Di 16 Kanûn 2010 de, topxaneya tirkî navçeya sînorî ya Sinatê, ku girêdayî Derkarê, qezayê Zaaxo, ye bombe kir. Kesek, Yasîn Îsa, ji gundê Giraka Sindî, mir û yekî din birîndar bû.

(peyamner.com, 16.12.2010)

SEROKA KARSAZÊN TIRK BI KURDÎ DIPEY-IVE

Di 15 Kanûn 2010 de, li zanîngeha Diclê, li Diyarbekirê, Civîna Bilind a 14mîn a karsazên (businessmen) tirk, TUKKONFED, dest pê kir. Di 17 Kanûn de, seroka TUSIADê, Ümit Boyner, axaftina xwe bi kurdî dest pê kir : “*Ji bo biratî, ji bo aştiyê hûn bi xêr hatin. Em aşitî û biratiyê dixwazin. Diyarbekir mala min e*”. Piştî, wê axaftina xwe bi tirkî ajot (dewam kir).

(rudaw.net, avestakurd.net, kurdistan-news.net, 17.12.2010)

RAPPORTA EKOPOLITIK LI SER PIRSA KURDÎ

Profêsorê tirk, Dr. Vamik Volkan, ji serokê komara tirkî, Abdullah Gül, re rapporta « Ekopolitik » li ser pirsê kurdî li Tirkiyê pêşkêş kir. Di raporê de 70 pêşniyar li ser vebabetê hene û dibêje ku divê ku stratejiyên girîng, li gora hesasiyeten Kurdan û xwekîşandina Tirkan, bên danîn.

(netkurd.com, rizgari.org, pukmedia.com, 20.12.2010)

BANGA DUZIMANÎ YA PARTIYA KURDÎ BDPÊ



Piştî giftûbêjan û banga ji bo bikaranîna du zimanan a hevserokê partiya ku bi awakî ne fermî kurdî yê « BDP », Selahattin Demirtaş, xwaringeh (rêstoran) û qehwe dest pê kir ku « menu »yên xwe bi du zimanan,

kurdî û tirkî, pêşkêş bikin. Hin bazargan navên meywe (fêkî) û heşinayîyan (sebze) bitenê bi kurdî îlan kirin. Serokê rêxistina vê partiye « KCD », Ahmet Türk, rûniştevan vexwendin (dawet kirin) ku di jiyana rojane de, nemaze di warê bazarganiyê de, bêtir zimanê xwe yê dayikî bi kar binin. Her du partiyên din ên kurdî, HAK-PAR û KADEP, piştgiriya vê înişiyatîvê kir.

(nefel.com, 19.12.2010 ; Milliyet, 24.12.2010)

RASTHATINA PARTIYA KURDÎ “BDP”Ê BI SEROKÊ PARLEMENTA TIRKÎ RE

Di 21 Kanûn 2010 de, şandeke partiya kurdî “BDP”ê, bi serokatiya Sehalattin Demirtaş, rastî serokê parlamenta tirkî, Mehmet Ali Şahin, hat. Piştî, wî ji çapemeniyê re da zanîn ku wê ji vî serokî xwest ku zimanê kurdî li hemî warên civakê bê bi kar anîn û ku ji dibistana dayikî heta zanîngehê bê hîn kirin. Bi ser de jî, şandê daxwaziya xwe ji bo “*otonomiyêke demokratîk*” da wî. Ev daxwazî berê hefteyekê li civîna rêxistina “KCD”ê (Kongra Civaka Dêmokratîk) hati bû giftûbêj kirin.

(netkurd.com, 21.12.2010)

LIHEVKIRINEKE TIRKÎ-SÛRÎ

Di 21 Kanûn 2010 de, lihevkirineke ji 11 xalan li ser ewlehî (emniyet), têkoşîna li dijî têrorîzmê (PKK) û xurtkirina pêwendiyên aborî û ramyariyê (siyasî) di navbera her du wetalan de li Ankarê ji aliyê serokwezîrê tirk, Recep Tayyip Erdoğan, û serokwezîrê sûrî, Muhammed Najî El-Utrî, bi amadebûna 26 wezîrên her du welatan, hat wajo (îmza) kirin. Piştî, konfêranseke çapemeniyê hat pêk anîn.

(peyamner.com, 22.12.2010)

SEROKÊ IRAQÊ LI TIRKIYÊ

Di 23 Kanûn 2010 de, li Ankara Civîna Bilind a Hevkariya Aborî dest pê kir. Serokê Iraqê, Celal Talabani (Kurd), beşdarî wê bû û ji ferzendê kelk girt (istifade kir) ji bo ku bi serokwezîrê tirk Recep Tayyip Erdoğan, serokê komara tirkî Abdullah Gül û berpirsiyarên partiya ku bi awakî ne fermî kurdî ye BDPê û serokê rêxistina KCDê, Ahmet Türk, re li ser pirsê kurdî li Tirkiyê bipeyive.

(avestakurd.net, rizgari.org, peyamner.com, ak-news.com, Milliyet, Hürriyet, 23.12.2010)

MERASÎMÊN ZEWACAN BI KURDÎ

Piştî kampanya partiya kurdî BDPê ji bo zimanê kurdî, merasîma zewacekê bi kurdî û tirkî li şaredariya Surê, yek ji şaredariyên Diyarbekirê, hat kirin.

(peyamner.com, 23.12.2010)

15 XORT NAXWAZIN KU BIÇIN LEŞKERIYÊ

15 xortên kurd ên Batmanê, li nêzîkî Diyarbekirê, bi daxuyaniyeke çapemeniyê da zanîn ku ew naxwazin ku xizmeta leşkerî bikin ji bo ku Kurdan nekujin. Di

demên dawîn de, xortên kurd ên navçeyên cihê “îfrazaya wicdanî” îlan dikin.

rizgari.org, 26.12.2010)

IMAMÊ MIZGEFTEKÊ JI SEDEMA XUTBA BI KURDÎ TÊ AVÊTIN

Selim Sadak, imamê serbixwe (ku ji aliyê dewletê ne hatiye tayîn kirin) mizgefta ku di 2005 de ji aliyê rûniştevên Şirnexê hati bû avakirin, ji bo ku wî xutbê bi kurdî dikir hat dûr xistin ! 5 sal tu pirsên (problêm, kêşe) wî nîn bûn, lê dema ku di 2010 de partiya kurdî BDPê kampanya zimanê kurdî û duzimanî ajot, ew ji aliyê muftiyê parêzgeha (wilayet) Sêrtê hat avêtin.

peyamner.com, 27.12.2010)

ŞAREDAREK TÊ TAWANBAR KIRIN

Şaredarê Kopê, li parêzgeha Mûşê, Cevdet Yaşar, ji aliyê dadgeha 14mîn a ceyazîn giran bi salek zîndan hat ceza kirin, ji bo ku wî di Newroza 2010 de helbesteke kurdî, ku wî nivîsî bû, xwend. Ew bi “propaganda rêxistinekê” hatiye tawanbar kirin. Parêzerê (avukat) wî li ber Dadgeha Bilind gilî kir.

avestarkurd.net, 29.12.2010)

PLAKÊTÊN ŞAREDARIYAN BI KURDÎ



Piştî kampanya partiya BDPê ji bo zimanê kurdî, şaredariya Cizîrê, weka şaredariyê din, plakêtên buroyên xwe bi plakêtên nuh, ku navên servîsan bi kurdî û tirkî nîşan didin, guherandin. Piştî, konferanseke çapemeniyê, bi kurdî û tirkî, li şaredariyê, ji aliyê cîgirê şaredar, Adem Gölçe, û alîkara şaredar, Hanım Okur, hat pêk anîn.

Şaredariya Wanê jî heman plakêtan li ser deriyên servîsên xwe hilawestandin (daleqandin). Bi ser de jî, rêxistinên partiya BDPê yê Kanîreş (Karlhova) û Agirî (Ağrı) dest bi berhevkirina wajoyan (imzayan) ji bo kampanya duzimanî kir.

rizgari.org, netkurd.com, Milliyet, 29.12.2010)

SERNIVÎSKAREKE BERÊ BI 138 SAL ZÎNDAN TÊ TAWANBAR KIRIN

Di 30 Kanûn 2010 de, sernivîskara berê ya kovara heftane ya kurdî „Azadiya Welat“, Emine Demir, ji aliyê dadgeheke Diyarbekirê bi 138 sal zîndan, ji bo piştigiriya rêxistineke têrrorist, hat tawanbar kirin. Ev yek, ji bo weşandina 84 gotaran li ser PKKê di 2008 û 2009 de. Ji bo her gotareke weşandî ew bi 1 sal û 6 meh zîndan hatiye tawanbar kirin.

Di Gulana buhurî de, sernivîskarekî din, Vedat Kurşun, bi 166 sal û 6 meh zîndan, ji bo „propaganda rêxistineke têrrorist“ di 103 hincetan (munasebet) de, hati bû tawanbar kirin. Di Sibate de, sernivîskarekî din, Ozan Kılınc, bi 21 sal zîndan hati bû tawanbar kirin.

Ev kovara heftane, ku di 1994 de avakirî, ji 2006 de bûye nîşana dadmendiya (edalet) tirkî, ku wê bi bûna dengê PKKê tawanbar dike.

azady.nl, rudaw.net, 20.12.2010)

ŞAREDAREK TÊ TAWANBAR KIRIN

Di 30 Kanûn 2010 de, dadgeheke Diyarbekirê şaredarê Sêrtê, Selim Sadak, bê amadebûna wî, bi 10 meh zîndan, ji bo piştigiriya PKKê, tawanbar kir. Ji berê jî ew ji aliyê vî dadgehê hati bû tawanbar kirin, lê cezayê wî hati bû kêmkirin.

aknews.com, 31.12.2010)

KARTÊN PÎROZKIRINÊ BI DU ZIMANAN ÊN ŞAREDAREKÎ JI SEROKÊN TIRK RE

Di 30 Kanûn 2010 de, şaredarê Colemêrgê, Fadil Bedirhaoğlu, ji serok û serokwezîrê tirk re kartên pîrozkirina sersalê bi kurdî û tirkî şandin. Piştî, wî ji rojnamevanan re daxuyand ku ewê di nêzik de servîsên şaredariya wî plakêtên duzimanî daleqînin.

rizgari.org, 31.12.2010)

SEREDANA SEROKÊ TIRK DIYARBEKIRÊ

Di 30 Kanûn 2010 de, serokê tirk, Abdullah Gül, çû Diyarbekirê û tê de ji aliyê şaredarê vî bajarî, Osman Baydemir, hat pêşwazî kirin. Wî tê de got ku tirkî zimanê tenê yê fermî (resmî) yê Tirkiyê ye, lê ku kurdî û erebî jî hene û ew dewlemendiya çandî ya welat pêk tînin. Berê vî seredanê, Encumena Ewlehiya Neteweyî (MGK) biryar stendi bû ku tirkî zimanê tenê yê fermî yê Tirkiyê ye.

Şaredarê Diyarbekirê ferhengeke kurdî-tirkî, ku ji 40.000 gotinan pêk hatiye, pêşkêşî Gül kir û jê re mafê bikaranîna her du zimanan li servîsên şaredariyê got. Û wî got jî ku Kurd mafê desthilata (îktidar, sulta) navçeyî ya siyasî û idarî jî dixwazin.

Bi hinceta vî seredanê, 5 partî û rêxistinên kurdî, HAK-PAR, KADEP, Tevgera Dêmkokratên Şoreşger ên Kurd, Koma Dyalogê Dicle Firat û Lêgerîna Kurdên

Dêmkokrat, daxuyaniyeke çapemeniyê weşand. Wan tê de got ku pirsê kurdî neteweyî ye û xwest ku ew bi awakî dad (adil) û dêmkokratîk, li gora pîvanên UNê (Rêxistina Neteweyên Yekbûyî), Yekîtiya Ewropî, Konseya Ewropa û yên din, bê çare kirin. Û wan ji

Tirkîyê xwest jî ku rewşên weha ku li welatên din hene weka kanî „réfêrence“ bistîne.

(Çapemeniya kurdî û tirkî, 31.12.2010)

KURDISTANA IRAQÊ

85.000 KARSAZ LI KURDISTANÊ

Serokê oda bazarganiyê ya Kurdistanê Iraqê, Dara Celîl Xeyat, daxuyand ku li 3 parêzgehên Kurdistanê 85.000 karsaz (businessmen) hene û ku ew bi anîna hebûnan (importation), bi birêvebirina şîrket û fabrîkan û şaxên din ên bazarganiyê xerîk (mijûl) in. Û wî got jî ku ji bo ku meriv bibe bazargan divê ku ciyekî wî yê naskirî hebe û di warekî bazarganiyê de pispor (mutehassis) be. Bi ser de jî, wî got ku ji bo ku bazargan pisportir bibin, pêwendiyên wan bi odayên bazarganiyê yên cihê li cihanê, bi riya odayên Kurdistanê ku tecrube dikin ku wan pêş de bibin û bigihînin asta (sewiye) bazarganiyeke nûjen, hene.

(rudaw.net, 04.12.2010)

NIMÎNENDETIYA KURDISTANÊ LI ISPANYA

Di 02 Kanûn 2010 de, bi merasîmekê li Medrîde, vekirina nimînendetiya Herêma Kurdistanê Iraqê li Ispanya bû. Nimînendeyê kurd, Daban Şedleh, xweşhatina mêvanên ku ji nav wan balyozê (sefir) Iraqê li Ispanya, Dr. Ziyad Xalid, û nimînendeyên navçeyên baskî û katalanî hebûn, xwest. Li dawiyê, filmeke belgeyî li ser dîrok, şareyarî (medeniyyet) û çanda gelê kurd hat nîşan dan.

(pukmedia.com, 02.12.2010)

ÊRÎŞ LI NAVÇEYÊN EREBKIRÎ YÊN KURDISTANÊ

Li taxeke Kerkûkê, kesên nenas ên çekdar bombeyek avêt ser buroya polîs. 3 polîs birîndar bûn.

(peymaner.com, 04.12.2010)

Di 14 Kanûn 2010 de, du bombe li Kerkûkê, li nêzîkî buroya hêzên ewlehiyê, teqiyên. Kesek hat kuştin û du jî birîndar kirin.

(pukmedia.com, 14.12.2010)

Di 21 Kanûn de, li gundê Qizibatê, qezayê Xaneqînê, bombeyek li ser erebeya berpirsiyarekî partiya Yekîtiya Niştîmanî Kurdistan teqiya. Berpirsiyar, Şelal Ehmed Elî, hat kuştin.

(pukmedia.com, 21.12.2010)

Di 23 Kanûn de, bombeyek li ser pageriyeke (polîsê gerrok) leşkerî, li qezayê Reşadê ku girêdayî Kerkûkê ye, teqiya. Serbazek (esker) hat kuştin.

(pukmedia.com, 23.12.2010)

ŞANDEKE PIROLÎ LI AMERÎKA

Li ser tewsiya serokê Kurdistanê Iraqê, Mesûd Berzanî, şandekê olî bi serokatiya Şêx Muhammed Şakelî, wezîrê berê yê weqfên olî, gerrek li Amerîka kir. Ew ji nimînendeyên hemî olên ku li Kurdistanê hene pêk hati bû. Şande rastî jimareke mezzin ji nimînendeyên sazandeyên (muessesse, institutions) fermî û yên zanîngehan, û bijareyên (élites) ramyariyê (siyasî) û akadêmîk hatin, ji bo ku ji wan re rewşa Kurdistanê Iraqê di warê hevjiyana olî de ravekin. Wê karî bû şirketeke amerîkî ya filman iqna bike ku filmeke belgeyî li ser rewşa nuha ya Kurdistanê çêke.

(pukmedia.com, 07.12.2010)

Ev seredan piştî qirkirina filleyan li dêreke Bexdadê û reva nêzîkî 1.000 malbatên fîlle Kurdistanê Iraqê bû (Buroya Kurdî : li bultena me ya berê, N° 68, binêre).

KONGREYA 13mîn A PDKê : MAFÊ ÇARENÛSÎ

Di 11 Kanûn 2010 de, li Hewlêrê kongreya 13mîn a PDKê (Partî Dêmkokratî Kurdistan), bi amadebûna jimareke mezzin ji nimînendeyên hukûmetên iraqî, tirkî û amerîkî, û yên Yekîtiya Ewropî, bû.

Di axaftina xwe ya vekirinê de, li ber 1.300 kesan, serokê Kurdistanê Iraqê, Mesûd Berzanî, bi awakî kûr rewşa Kurdistanê û daxwaziyeke wê yên ku hîn ne hatine bi cî anîn, weka veqerandina navçeyên ku di dema Saddam Huseyn de hati bûn ereb kirin, ku Kerkûk ji wan e, ji Kurdistanê re, ravekirin. Û ew li ser reşî Kurdan li perçeyên din ên Kurdistanê û mafê çarenûsî yê gelê kurd peyivî.

Kongre li bin duruşma (slogan) „Nuhkirin, Dadî û Bihevrejîyan“ derbas bû. Gelek biryarên girîng li ser bêtir dêmkorasî û nuhkirin li hundirê partiyeke hatin stendin. Çapemeniya tirkî û erebî li ser vê babetê gelek nivîsî.

(Çapemeniya kurdî, tirkî û erebî, 12.12.2010)

ŞANDEKE TOSKANÎ LI KURDISTANÊ

Di 15 Kanûn 2010 de, wezîrê çandê û cuhanan ê Kurdistana Iraqê, Kawe Mehmûd, pêşwaziya şandeke herêma Toskanê, li Italya, kir. Her du alî li ser mafên mirov, mafên jinan, parastina xwezayê (tabîet) û têkoşîna li dijî têrorîsma cihanî giftûbêj kir û daxwaziya xwe ya hevkarîyê, di warên ramyariyê, aborî û çandî de, nîşan da.

(peyamner.com, 15.12.2010)

ŞANDEKE KURDISTANÊ LI UKRANYA

Di 15 Kanûn 2010 de, protokoleke bazarganiyê li Dnîpr Petrovski, li Ukranya, di navbera şanda Import-Exportê ya Kurdistana Iraqê û Encumena Kar a ukrani de hat wajo (imza) kirin. Ev yek, piştî civînên ku çend rojan ajot (dewam kir).

Serokê şanda kurdî, Şêx Mustafa Abdurrahman, got ku berê wajokirina vê protokolê, şanda wî beşdar bû konfêranseke mezzin a bazarganiyê ku ji aliyê Encumena Kar a ukrani hati bû pêk anîn.

(peyamner.com, 16.12.2010)

KONSUXANEYEKE MISRÎ LI KURDISTANÊ

Di 25 Kanûn 2010 de, konsulxaneyê misrî li Hewlêrê ji aliyê wezîrê misrî yê karên derve, Ahmed Abdul-Khayt, bi amadebûna wezîrê iraqî yê karên derve Huşyar Zîbarî (Kurd), serokê parlamenta Kurdistanê Dr. Kemal Kerkûkî, wezîrê kurd ê hundir Kerîm Sincarî û jimareke mezzin ji berpirsiyarên ramyariyê yên kurd û iraqî, hat vekirin. Berê rojekê, wezîrê misrî rastî serokê Kurdistanê, Mesûd Berzanî, hat.

(peyamner.com, pukmedia.com, aknews.com, 26.12.2010)

BEŞEKE ZANÎNGEHÎ YA HUQÛQÊ YA KURDISTANÊ LI IRAQÊ YEKEMÎN E

Ji 11 heta 13 Kanûn 2010, li Hewlêrê yariyek (concours) di navbera 17 beşên zanîngehî yên huqûqê li tevayiya Iraqê, ji bo amadekirina yariyêke din a navneteweyî ku ewê li Amerîka di Adar 2011 de bibe, bû. Beşa huqûqê ya zanîngeha Duhokê, li Kurdistana Iraqê, bû yekemîn. Yaneya (équipe) biserketî ji 6 xwendekaran, ku ji wan 3 keç, pêk hati bû.

(peyamner.com, 27.12.2010)

KONFÊRANSEK LI SER LÊGERÎNA ZANYARIYÊ LI KURDISTANÊ

Ji 16 heta 18 Kanûn 2010, li Hewlêrê konfêransek bi navê „Revitalizing Research in Kurdistan“ (Vejiandina Lêgerînê li Kurdistanê) ji aliyê wezareta perwerdeya bilind û lêgerîna zanyariyê (ilmî) ya Kurdistana Iraqê

hat pêk anîn. Mêvanên ji 18 welatan beşdarî wê bûn. Serokwezîrê kurd, Dr. Behrem Salih, tê de beşdar vexwendin (dawet kirin) ku pêwendiyên bi hev re bikin û alîkariya berhevanîyê (investissement) di warê lêgerîna akademîk û zanyariyê de li Kurdistanê bikin. Û wî got jî ku hukûmeta wî 100 milyon dolar ji bo xwendina li derve terxan kirine.

(peyamner.com, 28.12.2010)

NEXWENDABÛN LI KURDISTANÊ 16% YE

Di 28 Kanûn 2010 de, wezîrê kurd ê perwerdê, Sefîn Diezyî, daxuyand ku di 2010 de nexwendabûn (analphabétisme, nezanebûna xwendin û nivîsînê) li Kurdistana Iraqê 16% ye, ku di 2000 û 2001 de ew 37% bû, û ku li dawiya 2015 ewê dakeve 10%. Û wî got jî ku ev pêşveçûna zû bi saya nexşeyê (plan) vekirina dibistanên perwerdeya bilez (acil) û yên êvarê ji bo kesên mezzin, bû.

Nuha, li 3 parêzgehên Kurdistanê 88 dibistanên perwerdeya bilez, ku 15.585 kes tê de dixwînin, hene. Ew ji bo kesên ku dibistanê berda bûn û ku temenê (umr) wan nahêle ku vegehin polên (sinif, classe) normal in.

(peymaner.com, 28.12.2010)

SEROKÊ KOREYA BAŞÛR NÎŞANA DÎPLOMASIYÊ DIDE NÊÇÎRVAN BERZANÎ

Di 29 Kanûn 2010 de, serokê Koreya Başûr, Li Mion Bak, nîşana dîplomasiyê, Gwan Gwan, da serokwezîrê berê yê Kurdistan Iraqê, Nêçîrvan Berzanî. Ev yek, ji bo ku wî roleke mezzin di pêwendiyên dîplomatkîk ên di navbera Koreya Başûr û Kurdistanê de lîzti bû. Ev nîşan ji serokên dewletan ê ku di avakirina pêwendiyên bi dewletên din re de jîndar (aktîf) in re tê dayîn. Nuha, Nêçîrvan Berzanî cîgirê serokê partiya PDKê ye.

(Çapemeniya kurdî, 30.12.2010)

Çend sal leşkerê koreyî beşdar bû bû pêşdebirina sîvîl a Kurdistana Iraqê (Buroya Kurdî)

FILLE LI IRAQÊ TÊN KUŞTIN

Di 30 Kanûn 2010 de, 6 bombe li taxên cihê yên filleyan, li Bexdadê, di navbera katjmêr (saet) 19 û 20 e, teqiyên. 2 kes hatin kuştin û 12 birîndar kirin.

(avestakurd.net, 30.12.2010; peyamner.com, 31.12.2010)

Ev cara duyemîn de ku, ji Teşrîn 2010 de, fille li Iraqê dibin nîşan (Buroya Kurdî : li bultena me ye buhurî binêre).

KURDISTANA ÎRANÊ

ÇALAKVANÊN KURD TÊN RAGIRTIN

Di 06 Kanûn 2010 de, sê çalakvanên kurd, Rahman Razxadîv, Mecîd Meryemî û Abdollah Rayegan, ji aliyê servîsên dîzzî yê îranî hatin ragirtin û birin zîndana Merîwanê, li Kurdistanana Îranê. Tu agahdarî li ser rewşa wan a nuha nîn e.

Ji sê mehan de, ji 30 çalakvanên ramyariyî, çandî û wêjeyî (edebî) yê kurd bêtir li bajarê Merîwanê hatine ragirtin. Di Hezîran 2010 de, Amnesty International êşkence, îdam û girtina rojnamevan, xwendekar û ronakbîran teşhîr kiri bûn.

(azady.nl, 06.12.2010)

LAŞÊ ÇALAKVANEKÎ KURD HUNDA BÛ

Şervanekî berê yê partiya kurdî PDK-Î, Hesên Hesenzade, li Finlanda ku tê de dijîya di 20 Teşrîn 2010 de mir. Ew li bajarê xwe Mako, li Kurdistanana Îranê, hat gor kirin. Piştî çend rojan malbata wî dît ku gora wî hati bû vekirin û ku laşê wî hunda bû bû. Li gel hemî tecrûbeyên wê li bal kesên fermî yê îranî, wê tu bersîv ne stend.

(Heftenama Rûdaw, N° 76, 21.12.2010)

ÎDAMA KURDEKÎ TÊ RAWESTANDIN, ENDA-MÊN MALBATA WÎ TÊN RAGIRTIN

Di 26 Kanûn 2010 de, çalakvanekî cuhan ê kurd, Habîbullah Latîfî, ewê bihata îdam kirin. Lê bi saya kampanyeke mezzin a navneteweyî, daxwaziya serokê Iraqê Celal Talabanî û riswakirinên (protêsto) Kurdan li cihanê, ev îdam hat rawestandî. Lê, piştî, 7 endamên malbata wî hatin ragirtin !

Latîfî, endamekî partiya PJAKê (baskê îranî yê PKKê), di 2007 de hati bû ragirtin û ji aliyê dadgeha Sinê, li Kurdistanana Îranê, bi dijminbûna Xwedê hati bû tawanbar kirin. Di 18.02.2009 de, wî hukmê îdamê, bê amadebûna parêzerekî, stendi bû.

(avestakurd.net, peyamner.com, pukmedia.com, 26 pu 29.12.2010)

Li gora malpera www.en-hrana, jimara kesên ku hatin ragirtin 20 bû. Ji wan 8 endamên malbatê û 12 mêvan. Nêzikî 30 endamên servîsên dîzzî bi şev ketin mala dê û bavê Latîfî û bi tundî (şiddet) êrişî herkesî kir.

KURDISTANA SÛRIYÊ

NIVÎSKAREK TÊ RAGIRTIN

Di 25 Teşrîn 2010 de, endamên ewlehiya ramyariyî ya sûrî nivîskarê kurd Abdussalam Abdullah Hacî Ibrahîm, ku bi navê Siyamend Ibrahîm hatiye nas kirin, ragirt. Di destpêkê de, jê re ferman hat dayîn ku biçe birêvebiriya ewlehiya ramyariyî li Qamişlî. Piştî, ew hat birin birêvebiriya Hesîçê.

Di 28 Teşrîn de, dadmendê (hakim) tenê yê leşkerî yê Qamişlî biryar stend ku divê ku tabanwarkirî li zîndanê bimîne û dosya wî şand dozkarê (procureur) Helebê. Nuha Ibrahîm li zîndana Qamişlî ye û daxwaziya parêzerê wî ku bê azad kirin ne hat pejirandin (qebûl kirin). Berê ragirtina wî bi çend hefteyan, wergerandineke bi kurdî ya destana Gilgames li nav çanta wî, li xala sînorî ya Qamişlî-Nuseybînê (li Kurdistanana Tirkîyê), hati bû dîtin. Ibrahîm ev metn li Tirkîyê stendi bû.

(kurdwatch.org, 01.12.2010)

ÇAR ÇALAKVAN TÊN TAWANBAR KIRIN

Di 28 Teşrîn 2010 de, dadmendê tenê yê leşkerî yê Qamişlî Şêxmûs El-Hesen, Xelîl Ibrahîm Muhammed, Muhammed Şêxmûs Îsa û Abdussalam Şêxmûs Meh-mûd bi 6 meh zîndan û cezayê 100 lîreyên sûrî, li gora bend 307 a zagona (qanûn) cinaî, tawanbar kirin. Ev

yek, ji bo ku ew beşdar bû bûn bîranîna nijadkujiya Halabca, li Kurdistanana Iraqê. Piştî, ev ceza hat daxistin 3 meh zîndan. Bi ser de jî, li gora bend 65, ewê di dema girtina xwe de ji hemî mafên xwe yê sîvîl bêpar (mehrûm) bibin.

(kurdwatch.org, 02.12.2010)

XWENDEKAREK TÊ TAWANBAR KIRIN

Di 28 Teşrîn 2010 de, dadmendê leşkerî yê Qamişlî xwendekarekî kurd û endamê partiya Azadî, Welîd Muhammed Elî Huseyn, bi 6 meh zîndan û dayîna cezayê 100 lîreyên sûrî, li gora bend 307 a zagona cinaî, hat tawanbar kirin. Bi ser de jî, li gora bend 65, ew di dema girtina xwe de ji mafên xwe yê sîvîl hat bêpar kirin.

(kurdwatch.org, 04.12.2010)

5 MIRÎ Û BIRÎNDAR LI ŞAMÊ

Li dawîya Teşrîn 2010, piştî pevçûnan di navbera hêzên ewlehiyê yê sûrî û jimareke kesên li Şamê, 5 kes mirin û çend jî birîndar bûn. Li gora malpera „suryun.net“, sedema vê yekê ew bû ku hin welatvan fotoya serokê sûrî Beşsar El-Esed şewitandi bû.

(avestakurd.net, 04.12.2010)

GUHERANDINA CIYÊN KAR ÊN KARMENDÊN KURD

Di 22 Teşrîn 2010 de, parêzgarê Hesîcê biryar stend ku Muhammed Xeyr Suleyman Bango, çalakvanekî ramyariyê yê kurd û alîgirê Partiya Yekîti, ji buroya wî ya saxiya dibistanê li Dirbêsiyyê, li Kurdistanê Sûriyê, derxîne û bişîne buroya perwerdê ya Hesîcê. Ev buroya dawîn 60 km ji mala wî ya li Amûdê dûr e. Di du salan de, ev cara 4mîn e ku ciyê karê Bango tê guherandin. Hozan Emîn Hac Hemo, ku ew jî çalakvanekî ramyariyê û alîgirê partiya kurdî Yekîti ye, ji buroya postê ya Amûdê hat şandin buroya Hesîcê.
(kurdwatch.org, 06.12.2010)

Di 08 Kanûn 2010 de, li gora rêxistina kurdî ya mafên mirov, DAD, karmendekî nexweşxana Dêrikê, Behzad Xelîl Muhammed, hat şandin nexweşxana Hesîcê, 200 km dûrî mala wî. Ev yek, piştî 26 sal xizmet.

DAD ji kar desxistina mamosteyekî kurd, Kamîran Hac Elî, jî teşhîr kir. Elî ji du salan de li gundê xwe, Gamîş, li nêzikî Dêrikê, mamoste bû.
(avestakurd.net, 10.12.2010; kurdwatch.org, 13.12.2010)

DU ÇALAKVAN TÊN TAWANBAR KIRIN

Di 20 Hezîran 2010 de, dadmendê leşkerî yê Qamişlî Welat û Salaheddîn Eyyûb Muhammed bi 6 meh zîndan, li gora bend 307 a zagona cinaî, tawanbar kirin. Piştê, ev ceza 4 meh hat kêmkirin. Ev biryar li ser bingeha bend 288 a zagona cinaî bi biryarnamê ya serokatîyê N° 22, a 24 Sibata 2010, hat stendin.

Ev kes ne bitenê bi hebûna weşanên bi kurdî yê partiya „El-Partî“, lê bi nivîsîna nîşankan (not) li ser van weşanan jî hatine tawanbar kirin.
(kurdwatch.org, 08.12.2010)

DU SERBAZ TÊN KUŞTIN

Di 09 Kanûn 2010 de, rêxistina kurdî ya mafên mirov, DAD, got ku serbazekî (esker) kurd, Muhammed Celal Muhammed, bi awakî sîrrî (ecêb), dema ku xizmeta xwe ya leşkerî li parêzgeha Humsê dikir, hat kuştin. Efsêrên (zabit) ku laşê wî radestî malbata wî kir got ku ew ji sedema şokeke êlektrîkî miriye !

Ev serbazê 9mîn e ku di 2010 de û 44mîn ji 2004 de, mêjuya (tarîx) serhildaneke kurdî ya gelek girîng, tê kuştin. Malbatên ku laşên zarokên xwe distînin dibêjin ku tê de şopên êşkence û kuştinê dibînin. Lê serbaz ji wan re dibêjin ku ew „qeza“ bûn !
(aknews.com, 09.12.2010)

Kurdekî din, Yûsiv Ferhan, ji Dirbêsiyyê, çend roj berê kutahbûna (xelabsûn) xizmeta wî ya leşkerî hat kuştin. Laşê wî hat dayîn malbata wî.
(avestakurd.net, 23.12.2010)

ÇÛNA KURDISTANA IRAQÊ JI DU RAMYARAN RE QEDEXE YE

Desthilatên sûrî ji Dr. Abdulkerîm Beşşar, sekreterê Partî Dêmoqrati Kurdistanê Sûriyê (El-Partî) û Muhammed Salih Gado, endamê buroya siyasî ya Partiya Kurdî ya Çep li Sûriyê, qedexe kir ku biçin Kurdistanê Iraqê, ji bo ku beşdar bibin kongreya PDKê (li jor, Kurdistanê Iraqê binêre).
(kurdwatch.org, 16.12.2010)

PENABEREKÎ QIBRISÊ TÊ RAGIRTIN

Di 04 Kanûn 2010 de, endamên ewlehiya ramyariyê (siyasî) ya Hesîcê Ciwan Yûsif Muhammed, ku di Hezîran 2010 de ji Qibrisê hati bû vegerandin û ku diviya bû ku pasaporta xwe li firokexana Şamê vegevine, ragirt. Piştê, ew çend caran ji aliyê servîsên ewlehiyê hat jê pirsîn. Li Qibrisê, Muhammed û penaberên din ên kurd çend rojan mangirtineke (grêv) birçîbûnê, ji bo riswakirina vegerandina xwe, kiri bû.
(kurdwatch.org, 17.12.2010)

JINEKE KURD TÊ TAWANBAR KIRIN

Dadgeha leşkerî ya Helebê Fatma Ahmed Hawol bi salek û nîv zîndan hat tawanbar kirin. Ew, li gora bend 287 a zagona cezayî ya sûrî, bi kirinên têkdar (ên ku xerab dikin), ku pêwendiyên Sûriyê bi welatên din re tev li hev dikin, hatiye tawanbar kirin.
(avestakurd.net, 18.12.2010)

KURDEK TÊ TAWANBAR KIRIN

Di 16 Kanûn 2010 de, dadgeha 3mîn a Helebê, Dr. Muhammed Xelîl Ebdî bi 3 meh zîndan, li gora bend 288 a zagona cinaî, tawanbar kir.
(kurdwatch.org, 20.12.2010)

3 KURD TÊN RAGIRTIN

Di 19 Kanûn 2010 de, sê Kurd, her du helbestvan, Umer Ebdî Ismaîl û Abdulsamad Huseyn Mehmûd, û Ehmed Fettah Ismaîl, xwediyê eywana fêstivala salane ya helbesta kurdî, hatin ragirtin. Her duyên pêşîn bi pêkanîna vê fêstivalê hatine tawanbar kirin.

Wê rojê, berê destpêkirina fêstivalê, hêzeke tevlihev a polîsên siyasî û sîvîl, bi hogiriya berpîrsiyarê navçeya Çilaxa, ciyê fêstivalê, li gundê Reşîkê, vegirt (işgal kir), kartên zanavê (nasname, kimlik, hewiyye) yê helbestvanan xwestin û ajoyên (şoffor) ku xelk anî bû fêstivalê birin jêpîrsînan.
(avestakurd.net, 22.12.2010; kurdwatch.org, 26.12.2010)

6 KES TÊN ÊŞKENCE KIRIN

Di 04 Teşrîn 2010 de, endamên polîsê leşkerî li Rumeylanê Mehmûd Mehmûd Zubeyr, bavê wî Zubeyr Mehmûd Hesên, Huseyn Şeref Abdullah, Ahmed Şeyxo Muhammed Elî, bavî wî Muhammed Elî Şeyxo Îsa, û Abdulqadir Xalo Muhammed ragirtin. Ew bi xwestina

derketina ji welat bi awakî illêgal hatine gûman (şibhe) kirin.

Di 11 Teşrîn de, ew hatin birin birêvebiriya polîsê ramyariyê yê Hesîçê. Di dirêjayiya jêpîrîne de ew bi mêtoda ku jê re „dûlab“ (tekerên ereban) dibêjin (meriv dixin nav tekerekê) û bi lêxistinê hatin êşkence kirin.

Di 19 Kanûn 2010 de, dadgeha cinaî ya Qamişlî biryar stend ku van her sê kesan, li hemberî dayîna cezayê 1.000 lîreyên sûrî, azad bike.
(kurdwatch.org, 23.12.2010)

DERMANFIROŞEK TÊ RAGIRTIN

Di 23 Kanûn 2010 de, endamên servîsên dîzî yê leşkerî li Qamişlî dermanfiroş Welîd Mehmûd Yûsif, endamê rêxistina kurdî ya parastina mafên mirov û azadiyên giştî li Sûriyê (DAD), ragirt.
(kurdwatch.org, 28.12.2010; avestakurd.net, 29.12.2010)

ZUHA BÛN LI KURDISTANA SÛRIYÊ

Rojname amerîkî New York Times rapporek li ser zuhabûnê li Kurdistanê Sûriyê weşand. Rapporê dîtina encumena UNê (Rêxistina Neteweyên Yekbûyî) ya mafê xwarinê weşand : Rûniştevanên Bakurê-Rojavaya Sûriyê (Cezîrê) 85% ji keriyên xwe hunda kirin û zuhabûnê zarar da 1.300.000 kesan.

Rappor peyt (isbat) dike ku planên şaş ên hukûmeta sûrî sedema giranbûna vê pîrsê ye. Di navbera 1988 û 2000 de, wê 15 milyar dolar ji bo projeyên avdanê, bê ku plan û projeyên wê encam (netîce) bibin, sarf kirin. Û ew dibêje jî ku sedema têkdana (xerabkirin) çandinê kesên berpirsiyar, ne bitenê zûhabûn (kêmbûna baranan), e. Rappor dibêje jî ku ev hukûmet nahêle ku rojnamevanên biyanî li ser vê pîrsê binivîsin û ku berpirsiyarên wezaretê çandinê biçin vê navçeya ku hema tevayiya genim û pembuyê Sûriyê derdixîne.
(avestakurd.net, 29.12.2010)

NÛÇEYÊN ÇANDÎ YÊN KURDÎ LI CIHANÊ

FÎLMEKE KURDÎ LI ALMANYA

Fîlma „Li New Yorkê 5 Minare“, ya filmçêkerê kurd ê Tirkîyê, Mahsum Kırmızıgül, li eywanên sînema yê Almanya hat nîşan dan. Ew li ser pîrsa radîkalbûna îslamî radiweste.
(Heftenameya Rûdawê, N° 73, Teşrîn 2010)

SEMÎNEREK LI SER SÎNEMA KURDÎ LI MISRÊ

Di 01 Kanûn 2010 de, Rêxistina Piştgiyîya Sînema li Qahirê semînerê li ser sînema kurdî, kûrbûna pêşveçûna wê û imkanên wê kir, ji bo xurtkirina pêwendiyên kurdî-misrî di vî warî de. Ev semîner di çarçeva Festivala 34mîn a Navneteweyî ya Sînema bû.
(pukmedia.com, 02.12.2010)

WERGERANDINA DESTANEKE KURDÎ BO TIRKÎ

Cara yekemîn wezaretê çand û guzariyê (tûrîsm) li Tirkîyê wergera bi tirkî ya destana kurdî ya navdar „Mem û Zîn“, ya helbestvanê sedsala 17mîn Ehmedî Xanî, weşand. Rûpelên ku tê de nivîsa aslî (orîjînal) ya bi tîpen erebî, rûpelên nivîsa aslî bi tîpen latînî, û yê wê wergerandina tirkî li dû hev in.

Di dema pêşkêşkirina pirtûkê de, wezîrê tirk ê çandê, Günay, perçeyê piçûk ji pirtûkê xwend û got : „*Ev pîrê şairê û kartêkerê (ku li ser meriv te'sîr dike). Ew ji kûrayîya dilê tê. Bi kîjan zîmanê Anatolya be, bîna vê axê, bedewbûna kulîlkên van ciyan û bayekê hênîk jê tîn*“.

(netkurd.com, azady.nl, pukmedia.com, 02.12.2010)

NAVMALIYEK SÊRAMÎKAN LI KURDISTANA IRAQÊ PÊŞAN DIDE

Di 01 Kanûn 2010 de, navmaliyê (xizmetçî) kurd, Evîn Xelîl, 26 salî, peykerên (heykel) xwe yê sêramîk li pêşangeha „Huner û Tebîet“ê, ku ji aliyê Rêxistina Hevaltiya Kurdistan-Koreya Başûr li Hewlêrê hat pêk anîn, pêşan dan. Seroka rêxistinê, Naz Felekeddîn, got ku rêxistina wê dixwaze ku „*jîndarbûn û ênêrjiya jina kurd*“ nîşan bide. Û wê got jî ku ev biryar bi hinceta (munasebet) kampanyê rakirina tundiyê (şiddet) li dijî jinan, ku di 25 Teşrîn 2010 de li Kurdistanê Iraqê hat dest pê kirin, hat stendin.
(aknews.com, 02.12.2010)

FÊSTIVALA FOLKLORA YEZÎDÎ LI KURDISTANA IRAQÊ

Di 03 Kanûn 2010 de, Fêstivala Çand û Hunera Dest a Kurdên Yezîdî li perestgeha yezîdî Laliş dest pê kir. Destgehên (alet) çandin û çînînê, cill û xwarin, û pirtûkên ku ji aliyê Kurdên Yezîdî yan li ser wan hatine nivîsîn hatin pêşan dan.
(aknews.com, 03.12.2010)

FÎLMÊN KURDÎ LI FÊSTIVALA FÎLMÊ YA TEHRANÊ

Di destpêka Kanûn 2010 de, Fêstivala 27mîn a Navneteweyî ya Fîlma Kurt li Tehranê, li Îranê, dest pê kir. 16 fîlm ji Kurdistanê Îranê hatin nîşan dan. 3.500 fîlm, ji 100 welatan, tê de hatin nîşan dan. Fransa, bi 411 fîlman, beşdara herî mezzin bû. Piştre, Almanya bi 213,

Ispanya bi 188, Ingiltere bi 182 û Brazîlya bi 169 filman.

azady.nl, 05.12.2010)

ÇAPEKE NUH BI TIRKÎ YA DÎWANA MELAYÊ CIZÎRÎ

Weşanxana kurdî Nûbihar nuh berhema bi tirkî ya Prof. Dr. Abdulbaki Turan, ya bi navê « Melayê Cizîrî Divani ve Şerhi » (Dîwana Melayê Cizîrî û Şirovekirina wê), weşand. Ev zanayê olî bi salan li ser amadekirina vê weşanê xebitî. Melayê Cizîrî yek ji navdartirîn helbestvanên kurd ên sedsala 16mîn e.

nefel.com, 06.12.2010)

XELATEK JI FÎLMEKE KURDÎ RE LI ISTANBÛLÊ

Fîlma kurdî « Beriya Tofanê », ya filmçêkerê kurd Ferit Karahan, Xelata baştirîn afirandin li Fêstivala Navneteweyî ya Fîlma Kurt a Istanbûlê stend. Fîlm bi perçeyekê ji Tewratê dest pê dike û li ser pirsra otoritarîsmê (diktatoriyê) li hemî astan (sewiye) : a dewletê, a bav ... radiweste.

Heftenameya Rûdawê, N° 74, 07.12.2010)

TAHLÛLKIRINA ROMANA KURDÎ

Du nivîskarên kurd ên Tirkîyê, Abidin Parîltî û Özlem Galip, pirtûkek bi tirkî, bi navê « Kürt Romanı Okuma Kılavuzu » (Klavveya Xwendina Romana Kurdî), nivîsî û ew ji aliyê weşanxana Sel hat weşandin. Amanca nivîskaran ew e ku peyt (isbat) bikin ku dîtinên kesên ku dibêjin ku wêje (edebiyat) û romana kurdî nîn in çewt in. Ew tê de li ser destpêka hebûna romana kurdî, kesên ku berê afirandina wê hebûn û rê li ber wê vekir, û li ser damezrana (structure) wê dipeyivin. Û ew tê de berhemên jimareke mezzin a romannivîsên kurd, ên kevn û nuh, tahlîl dikin.

Abidin Parîltî ji zû de di beşa « Kürdili » (Zimanê kurdî) de, li rojnama tirkî « Radikal »ê dixebite. Özlem Galip li Ingilê dijî û doktorayekê li ser romana kurdî amade dike.

Çapemeniya kurdî, 08.12.2010)

PIRTÛKEK LI SER KURDÊN ALMANYA

Pirtûkeke lêkolînê, bi navê « Kurdên Almanyayê », bi kurdî ji aliyê civakzan (sociologue) Zeki Özmen, Kurdekî Tirkîyê ku li Almaniya dijî, hat nivîsîn û ji aliyê weşanxana Ronahî, li Diyarbekirê, hat weşandin. Nivîskar tê de li ser Kurdên pêşîn ên ku di dema imperatoriyên Osmanî û Farişî de çû bûn Almaniya dipeyive. Piştî, ew pêlên cihê yê çûna vî welatî û sedemên wan waf dike. Li dawiyê, ew navên rêxistinên ku tê de hatine ava kirin û rewşa wan a nuha dibêje.

avestakurd.net, 09.12.2010)

PIRTÛKEK BI TIRKÎ LI SER KURDAN

Nivîskar û lêger Rohat Alakom, Kurdekî Tirkîyê ku li Swêdê dijî, pirtûkeke bi tirkî li ser Kurdan, bi sernivîsa « Türk Edebiyatında Kürtler » (Kurd di Edebiyata Tirkî de), nivîsî. Ew ji aliyê weşanxana kurdî Avesta, li Istanbûlê hatiye weşandin.

nefel.com, rizgari.org, aknews.com, 09.12.2010 ; pukmedia.com, 13.12.2010)

FÊSTIVALA FÎLMA KURDÎ LI ROMA

Di 09 Kanûn 2010 de, Fêstivala 3mîn a Fîlma Kurdî li Roma, li Îtalya dest pê kir. Ewê sê rojan bajo û filmên belgeyî û yê kurt, ku ji aliyê filçêkerên ji perçeyên cihê yê Kurdistanê û ji revendê (diaspora), ewê tê de bèn nîşan dan.

pukmedia.com, 09.12.2010)

PEYKERÊ JINEKE ŞOREŞGER LI KURDISTANA IRAQÊ

Di 09 Kanûn 2010 de, li Parka Peykeran (heykel), li bajarê Suleymaniyê, merasîma vekirina peykerê jina kurd a navdar, Hapsaxanî Naqîb, ku ji aliyê peykertiraş Ranj Osman Çewar hatiye çêkirin, bû. Di 1940 de, ev xatûn rêxistina yekemîn a jinên kurd li Kurdistanê Iraqê ava kiri bû. Ji bo ku ew mamoste bû, wê hemî jiyana xwe da gihandina jinên kurd û têkoşîna ji bo doza kurdî.

aknews.com, 10.12.2010)

3 XELAT JI SÎNEMA KURDÎ RE LI BEXDADÊ

Ji 04 heta 08 Kanûn 2010, li Bexdadê Festivala 1mîn a Fîlma Cîranên Iraqê bû. 3 filmên kurdî tê de xelat stendin : Xelata baştirîn lîzvan (aktor) ji Umer Çawşîn re, di fîlma « Pisepis le gel ba », Xelata baştirîn afirandin ji Şewket Emîn re, ji bo fîlma « Darba Destpêkê » û Xelata baştirîn berhemanî ji filmçêker Hesên Elî re, ji bo fîlma « Kuçeyên Tirsandinokan », hat dayîn.

pukmedia.com, 11.12.2010)

KONFÊRANS LI SER KURDAN LI AMERÎKA

Di 11 Kanûn 2010 de, Enstituya Brookings konfêransek bi navê « Pirsra Kurdî li Tirkîyê : Ferzendeke nuh û Zorî » pêk anî. Pispore amerîkî Henri Barkey, ji Carnegie Endowment, got ku çarekirina pirsra kurdî ewê zemanekî dirêj, di navbera 10 û 20 salan de, bajo. Ömer Taşpınar, pispore Enstituya Brookings, jî got ku hemî kesên ramyarî (siyasî) û leşkerî li Tirkîyê tê gihajt (fehm kir) ku ji pirsra PKKê bêtir, ev pirsra „nasyonalîzma kurdî“ ye û ku „şeytan îcar ji qutiye derket û Kurd daxwaziyên xwe bêtir kirin“ . Birêvebirê bernama Tirkîyê yê Enstituya Rojhilata Navîn, Gönül Tol, got ku li gora hemî hukûmetên berê, hukûmeta partiya nuha AKPê xurttir e û ku ji bo vê yekê ew dikare rîskên siyasî, bi tecrubekirina çarekirina pirsra kurdî, bistîne.

Milliyet, 12.12.2010; rizgari.org, 13.12.2010)

DÎLANÊN KURDÎ LI IMARATÊN EREBÎ



Koma Hunera Gelerî ya Kurdistanê Iraqê bi dîlanên kurdî beşdar bû Fêstivaleke Navneteweyî ku li sê bajaên Imaratên Erebî yê Yekbûyî, bi hinceta 39 saliya avabûna van Imaratan, hat pêk anîn.

Vê fêstivalê ji 01 heta 06 Kanûn 2010 ajot. 11 welat beşdarî wê bûn. Li Dubai, 3.000 temaşevan li dîlanên kurdî nêrî.

aknews.com, 13.12.2010)

KURD LI PARLENTA DANIMARKÊ

Di 09 Kanûn 2010 de, parlamenta danimarkî rêsêpsyonek (koktêl) ji bo rûmetkirina serokê berê yê Partiya Sosyalîst a Gel (SF), Holger K. Nielsen, ji bo pîrozkirina 25 salên xebata wî li parlamentê, pêk anî.



Mîrza Nielson hevaleyê mezzin ê gelê kurd e û wî hergav ew parastîye. Ji derveyî wezîr, serokên partiyên û endamên parlamentê, 6 partî û rêxistinên çandî yê kurdî, ji perçeyên cihê yê Kurdistanê, beşdarî wê bûn.

avestakurd.net, 13.12.2010)

ŞAREDAKÊ KURD LI STOKHOLMÊ TÊ HILBIJARTIN

Ev bû cara 2mîn e ku Kurdekî Tirkîyê, Abit Dündar, weka şaredarê şaredariyên Hägersten-Liljeholmen, li Sokholmê, ku tê de 80.000 kes rûdinên, tê hilbijartin. Dündar endamê Partiya Gel (Folk Parti) ye. Li hilbijartinên berê, ew ji bo 4 salan hati bû hilbijartin.

netkurd.com, 14.12.2010)

XWENDEKARÊN KURD LI FÊSTIVALEKÊ LI UKRANYA

Xwendekarên kurd ji çar perçeyên Kurdistanê beşdar bûn çalakîyên çandî li Fêstivala Çandî û Hunerî ya gelên biyanî. Ew ji aliyê servîsa biyaniyan a parêzgeha Xarkovê hati bû pêk anîn. Ji derveyî Kurdan, Ereb, Farris, Ermenî, Azerî, Çînî, Pakistanî û wekî din hebûn.

peyamner.com, 16.12.2010)

SHAKESPEARE TÊ WERGERANDIN KURDÎ

Nivîskar û wergêrê (tercuman) kurd Kawa Nemir wergerandina xwe ya bi kurdî ya “Hemî Sonatên Shakespeare” pêşkêşî Odeya Danişmendên (muşawir) Malî û Xeznedarên (muhasib) Serbixwe yê Diyarbekirê, kir.

Li merasîma pêşkêşkirinê, Nemir got ku wî ev wergerandin di 16 salan de kiriye. Beşeke pirtûkê bi inglîzî û beşeke din bi kurdî ye.

rudaw.net, 16.12.2010)

KONSÊREKE ERMENÎ-KURDÎ-TIRKÎ LI ISTANBÛLÊ

Di 16 Kanûn 2010 de, pyanîstê ermenî Şahan Azruni li eywana civînan a Lutfî Kidar, li Istanbulê, konsêreke ermenî-kurdî-tirkî pêk anî. Ev yek ji bo bîranîna 75mîn a mirina muzîkologê ermenî yê navdar Komitas ku lêgerînên gelek girîng li ser muzîka gelerî ya gelên cihê yê Tirkîyê kiri bûn. Ew li Kutahya, li Tirkîyê bû wî li Berlînê muzîk xwendî bû. Têza wî li ser muzîka kurdî, bi navê “Muzîka gelerî ya kurdî”, bû.

Li vê konsêrê, stranbêj û komên muzîkê yê ermenî, kurdî û tirkî bernameyên xwe, bi amadebûna wezîrê tirk ê çand û geştê (tûrîsm) Ertuğrul Günay, patrîrkê ortodoks ê Istanbulê Bartholomeos û jimareke mezzin ji hunermend û rojnamevanan, pêşkêş kirin.

aknews.com, 17.12.2010)

KURD LI FWARA PIRTÛKÊ LI WELATÊ BASK

Ji 30 Teşrîn heta 07 Kanûn 2010, Fwara Pirtûkê li Durango, li Welatê Bask, li Ispanya, bû. Tê de maseyên (stand) pirtûkên li ser Kurdan hatin vekirin. Roja 2mîn hema bitenê li ser çanda kurdî bû. Nivîskar, hunermend û rojnamevanên kurd ji çar perçeyên Kurdistanê û ji welatên Ewropa yê cihê, û nimînendeyê hukûmeta Kurdistanê Iraqê li Ispanya, hati bû vexwendin. Gîftûbêj li ser rewşa zimanê kurdî û azadiya ravekirinê (tabîr) li Kurdistanê, xwendina helbestan û dîlanên

zarokan ên kurdî bûn. Li dawiya rojê, gelek kes ketin dîlanê. Êvarê, şîvek ji Kurdan re li xwaringehê (rêstoran) hat dayîn.

Ji nav pirtûkên ku hati bûn pêşan dan, kurteyêke bi zimanê baskî ya destana navdar Mem û Zîn a sedsala 17mîn, a Ehmedî Xanî, hebû. Û pirtûkek li ser Kurdan bi zimanê ispanî jî hebû.

rizgari.org, 19.12.2010)

STRANBÊJEKE HONGARÎ BI KURDÎ DISTIRÊ

Stranbêja hongarî Hannah Berger komeke bi navê tirkî “Grup Arasında” (Di Nav Koman De) ava kir. Ew tê de bi bosnî, sîrbî, ispanî, makêdonî, tirkî, kurdî û rûmanî distirê. Heta nuha, vê komê sê album weşandine. Berger stiranên kurdî tê de dide nasîn : “*Sedema kûrbûna stiran û muzîka kurdî dîrok û erdnigariya (coxrafya) wê ya gelek kevn e. Ez hest dikim (dihesim) ku muzîka vî gelî ji dîroka wî ya kevnar derdikeve*”. Û wê got jî ku di albuma xwe ya nuh de ewê bi kurdî bistirê, ji bo ku balan bikişîne qedexekirina zimanê kurdî û ji bo ku ew jî ahenga vî zimanî hez dike. Berger li Budapestê bûye û grafolojiyê li Istanbulê hîn dike.

aknews.com, 20.12.2010)

ŞANOYA KURDÎ LI LONDONÊ

Şanoyeke (théâtre) kurdî, bi navê “Bajar û Aştî” li Londonê hat pêşkêş kirin. Ew ji aliyê Sîmîn Çayçî hatiye nivîsîn, ji aliyê Karzan Şêrebeyanî hatiye çêkirin û ji aliyê komeke Kurdên ku li Ingilterê dijîn hatiye lîz-tin. Babeta (thème) vê şanoyê lêgerîna bajarekî evîn, dilsozî û mirovahiyê ye.

Şanoçêker Karzan Şêrebeyanî, Kurdekî Iraqê yê ji Kerkûkê ye. Wî mêdya û sînema li zanîngeha Londonê xwendiyê û weka lîzvan (acteur), şanoçêker û nivîskar di gelek şano, film û filmên belgeyî de kar kiriye.

aknews.com, 20.12.2010)

BOKSOREKÎ KURD LI IMARATÊN EREBÎ BI SER DIKEVE

Boksorê kurd Luey Nadir berra şampyonê cihanê yê tunisî, Muaz Ben Cum'a, da. Ev yek li şampyona navneteweyî ya boksê ji bo pisporan (mutexassis), ku li kluba efserên (zabit) hêzên leşkerî yên bajarê Abu Dabî bû.

pukmedia.com, 22.12.2010)

ŞANOYEKE KURDÎ LI ROMA

Di 21 Kanûn 2010 de, bi hinceta dawiya payîzê û destpêka zivistanê, xwendekarên kurd ên şano, sînema û mêdya, li zanîngeha Roma, şanoya William Shakespeare, “Sonata payîzê”, lîzt. Ew ji aliyê Keyhan Wiledbegî hatiye çêkirin û ji aliyê Semîre Muradî, Xebat Qadirî û Karwan Xewrew hatiye lîz-tin. Şano dawiya diktatoriyan li cihanê simbolîze dike.

aknews.com, 22.12.2010)

FÎLMEKE KURDÎ LI NORVÊJÊ BAŞTRÎN E

Kovara norvêjî “Rushprint” lêgerînek li ser filmên ku li Norvêjê di navbera 2000 û 2010 de hatine çêkirin kir. Wê 10 weka baştrîn film bijartin. Ji nav wan, filma “Bawke” (Bav), a filmçêkerê kurd ê Iraqê, Hişam Zaman, weka baştrîn hat bijartin. Ev filma 15 xulekan (deqge) li Norvêjê di 2005 de hati bû çêkirin û heta nuha ji 40 xelat bêtir stendine. Ew çîroka koçbûna bavekî û kurrê wî yê piçûk dibêje. Ew ji Almanyaya tîr qewirandin û diçin ber bi Norvêjê. Film vê riya koçbûnê bi awakî gelek hestaker dibêje.

aknews.com, 22.12.2010)

WÊJEYA DEVKÎ LI KURDISTANA TIRKIYÊ

Di 17 Kanûn 2010 de, rojek bi navê “Dengbêjî û Edebiyata Devkî” li Bedlîsê (Bitlis), li eywana birêvebiriya çand û geştê (tûrîsm), bi piştgiriya wezaretê tirkî ya çand û geştê, hat pêk anîn.

Di destpêkê de, danişmendê (muşawir) wezîrê çandê, Nihat Gül; birêvebirê giştî yê lêgerîn û perwerdê yê wezaretê çandê, Mahmut Evcuran, û parêzgarê (wafî) Bedlîsê, Nurettin Yılmaz, peyivîn û girîngiya folklor, çand, ziman û wêjeya (edebiyat) kurdî dest nîşan da. Piştî çend komên xebatê (atelier) bûn :

Atelyeyek bi navê “Mîrata Çandî : Dengbêjî). Prof. Dr. Kadri Yıldırım, mamoste li zanîngeha Mêrdînê; dekan Dr. Abdullah Kiran, ji zanîngeha Alparslanê; rojnamevan û nivîskar Salih Kevirbirî, rojnamevan Abidin Paçalıtı, û nimînendeyekî wezaretê çandê, Timur Yılmaz, beşdarî wê bûn.

Êvarê, atelyeyêke din, bi beşdarbûna 15 dengbêj û muzîkvanên ku ji navçeyên cihê yên Kurdistanê Tirkîyê hati bûn, bû.

Roj bi konsêreke ku ji aliyê dengbêjan hat dayîn kutah (xelas) bû. Tiştê herî balkêş ew e ku dengbêj Evdilqadir Kızılkaya çend caran gotina “Kurdistan”ê bi lêv kir !

rizgari.org, 22.12.2010)

DU PIRTÛK JI INGILÎZÎ HATINE WERGERANDIN

Nivîskarê kurd Emîn Narozi du pirtûkên girîng li ser dîroka kurdî ji ingilîzî wergerandin kurdî : « Şeddadî di lêgerînên li ser dîroka Qefqasya de », ya nivîskarê rûs ê navdar Vladimir Minorsky. Ew ji aliyê weşanxana kurdî Avesta li Istanbulê hat weşandin. Di 2008 de, wî « Pêşdîroka Selaheddîn » (Selaheddînê Eyyûbî) wergerandi bû.

rizgari.org, kurdistan-news.net, 22.12.2010)

FÎLMEKE KURDÎ LI BASRA YEKEMÎN E

Li fêstivala sînema Basra, li Başûrê Iraqê, filma kurdî ya kurt, « Sluid », xelata yekemîn stend. Ew ji aliyê Kamiran Betasî hatiye nivîsîn û ji aliyê Koma Çandî ya

Zaxo hat pêşkêş kirin. Babeta wê dijberiya ebedî di navbera jiyana û mirî de ye.
(aknews.com, 22.12.2010)

KURDEK JI YEKÎTIYA SOVYÊTÎ YA BERÊ DIBE ENDAMÊ RÛMETÊ YA AKADÊMIYEKE KURDISTANA IRAQÊ

Akadêmîsyenê kurd ê Yekîtiya Sovyêti ya Berê, Nadir Nadirov, weka endamê rûmetê (şeref) ê akadêmiya zanînan (ilm) ya Kurdistana Iraqê hat nîşan kirin. Ev yek ji bo nivîsên wî di warên cihê de. Ev cara yekemîn e ku Kurdekî Yekîtiya Sovyêti ya Berê dibe endamê vê akadêmiyê.

(pukmedia.com, 23.12.2010)

ŞANOYEKE NORVÊJÎ LI KURDISTANA IRAQÊ

Di 22 Kanûn 2010 de, şanoya norvêjî ya navdar « Mala Bûkê », ya Henrik Ibsen, bi kurdî (bi soranî : Malî Bûke Şûşe) li Kollêja Hunerên Bedew, li Suleymaniyê hat lîztin. Ev yek, bi hinceta sersaliya 129mîn a pêşkêşkirina vê şanoyê li Norvêjê. Ew bi hişkî normên (mîzan) zewacê di sedsala 19mîn de rexne dike. Şanoya bi kurdî ji aliyê xwendekareke kevn a hunera dramî, Alza Aram, hat bi rê ve birin.

(aknews.com, 23.12.2010)

FÊSTIVALA FÎLMÊ LI KURDISTANA IRAQÊ

Di 23 Kanûn 2010 de, li Suleymaniyê Fêstivala 3mîn a Fîlma Kurdî dest pê kir. 35 fîlmên filçêkerên kurd, ji çar perçeyên Kurdistanê, tê de hatin nîşan dan. Ewê fêstival heta 28 Kanûn baxo û ewê xelat ji baştirîn fîlman re bên dayîn.

(pukmedia.com, 24.12.2010 ; rudaw.net, 25.12.2010)

JINEKE KURD JI BAŞTIRÎN SIYASIYAN LI DANIMARKÊ

Rojnama danimarkî ya mezzin “Politiken” navên 50navdartirîn ramyaran (siyastvan) li Danimarkê weşandin. Ji nav wan, Kurdeke Tirkîyê, Özlem Sara

Çekiç, parlementerke Partiya Sosyalîst a Gel. Ew 28mîn hat hilbijartin.

XELATEK JI KURDEKÎ RE LI FÊSTIVALA FÎLMÊ YA GENTÊ, LI BELJÎKA

Li Festivala 37mîn a Fîlmê ya Gentê (Gand), li Beljîka, muzîkçêkerê (compositeur) kurd ê cuhan, Karzan Mehmûd, Xelata Sabamê, ku ji baştirîn muzîkçêkerê cuhan ê ewropî re hat dayîn, stend. Ev yek, ji bo muzîka wî ya filma „Kwestan û Germiyan“, a têlêvîzyona kurdî Kursatê. 145 hunermendên cuhan ên Ewropa beşdarî vê fêstivalê bûn.

Mehmûd Kurdekî Iraqê ku li Swêdî dijî ye. Ew ahengan (mélodies) diafirîne û ew kaniyeke mezzin ji bo gelek stranbêj û dramayên têlêvîzyonê ye. Jina wî Kanî di pîşesaziya (sina’et) muzîkê de kar dike. Albuma wê ya dawîn bi ahengên mêrê wê hatine dewlemend kirin.

(azady.nl, 27.12.2010)

3 XELATÊN NAVNETEWYÊ JI FOTOKÊŞEKÎ KURD RE

Kovara hunerî ya navneteweyî, Light and Composition, 3 xelat dan 3 fotoyên Mehmet Masum Suer, fotokêş û rojnamevanekî kurd ku li Diyarbekirê, li Kurdistana Tirkîyê, dijî. Ev foto weka „Fotoyên Rojê”, ji nav bi sedan fotoyên fotokêşên din ên pispor hatin bijartin.

(kurdistan-news.net, 31.12.2010)

HELBESTVANEKÎ KURD JI BO 2011 LI KANADA HAT HILBIJARTIN

Rojnama kanadî Edmonton helbestvanê (şair) kurd Celal Berzencî ji nav 10 kesahiyên (şexsiyyet) koçber ên sala 2011 bijart. Ev yek ji bo berhema wî ya bi sernavê „Zilamê bi pîjama heşîn“, yek ji bîranînên wî yê li ser jiyana li zîndanê, di dema Saddam Huseyn de.

(kurdistan-net.net, 31.12.2010)

BRUSSELS HOOFDSTEDERLIJK GEWEST
VLAAMSE GEMEENSCHAPSCOMMISSIE



Ev bulten, bi alîkariya Vlaamse Gemeenschapscommissie (VGC), bi kurdî, fransî, hollandî û ingilîzî hatiye weşandin.